

02

# Zerka Zêran

Çirokeka folklorî





Yek ji projeyê Ararat Groupê ye.

Birêveberîya projeyê:

Silêman Osman - Raman Hesê

Edîtor û sererastker:

Ara Zarok

Nîgar:

Nêçîrvan Ehmed

Dîzayin û amadekarî:

Mihemed Osman

Hesan Mihemed

Şînda Ekrem

Cûdî Elî



Weşanxaneya Şîlîrê, Qamişlo

weshanashiler@gmail.com

[www.shlier.info](http://www.shlier.info)

Çapa yekê  
Qamişlo 2022'ê

Çapxaneya şêhîd Herekol, Dêrik



+963 989 966 863



@arazarok.online



Ara Zarok



@arazarok\_online



@arazarok.online



zarok@arasat.online

©Hemû maf parastîne.

[www.arasat.online/zarok](http://www.arasat.online/zarok)



**Hebû, tine bû.**

**Hebû keçikek jê ra digotin Zerka Zêran.  
Ew keçeka gelekî xweşik, jîr, zana û jêhatî bû.  
Zerka Zêran xwişka heft biran bû!**

**Rojekê ji rojan, Zerka Zêran û hevalên xwe çûn çolê, qırşık û pûş didin hev.**

**Dêya wê jê ra hinek sewik û şekir xistibûn torbeyekî da ku li çolê bixwe.**

**Dema gihan çolê, dest bi daneheva pûş kirin, lê Zerka Zêran ji ber a herî jêhatî bû, berî her kesî piştîyê xwe girê da, li ser mîrgê rûnişt û torbeyê xwe der xist, şekir û sewikên xwe xwarin.**



“Ev der baş e.  
Werin!”



**Piştî zîkê xwe têr kir, ji hevalên xwe ra got: "Ez ê li ber sîha piştîyê xwe hinekî razêm! Heger we jî karê xwe bi dawî anî û piştîyên xwe girê dan, min ji xew rakin, em bi hev ra herin malê."**

**Hevalên wê piştîyên xwe girê dan, lê Zerka Zêran ji xew şîyar nekirin, ji ber çavêن wan bar nedibû ku Zerka Zêran ew qasî jêhatî ye û her tim zora wan dibe.**

**Zerka Zêran dî xewa xwe ya şirîn da bû û hayê wê jî dînyayê tîne bû, nizanibû ku hevalên wê çûne malê û ew li çola xir û vala bi şûn da hiştine.**

**Hema carekê ji nişkan ve ji xew şîyar dibe, çavêن xwe vedîke; ku hey looo ci bibîne! Ne kes û ne kûs, dînya bûye şev û ew bi tena xwe li çolê ye!**





**Rebenê nema zanibû çi bike! Li dora xwe dinihêrî û bang dîkir:  
"Yadêê! Hewar werin bi min ve!"**

**Lê ti kes bi hewara wê ve neçû, tenê dengek lê vegerand û got:  
"Tu çi dixwazî? Ez im, ez dêya te me!"**

**Zerka Zêran got: "Na! Ev ne dengê dayika min e,  
dengê dêya min zirav û nazik e!"**

**Wextek derbas bû, dîsa Zerka Zêran bang kir:  
"Yaboo! Werin bi hewara min ve!"**

**Dîsa dengekî lê vegerand û got: "Tu çi dixwazî? Ez im, ez bavê te me!"**

**Lê Zerka Zêran got: "Na! Ev ne dengê bavê min e,  
dengê bavê min bilind û stûr e!"**





Ji nişkan ve Hirçek xuya bû û bi ser da hat; ziravê Zerka Zêran jî tırsan qetiya û ji ser hişê xwe ve çû!  
Hirç bi çepilê wê girt, li pişta xwe kir û bire şkefta xwe.

Wextek derbas bû, Zerka Zêran li ser hişê xwe hat, çarmêrikî rûnişt, dît li şkeftekê ye û Hirçek li wir e, bawer nekir!

Çavên xwe zîq kirin, li ser hev vekirin û girtin, du sê caran firikandin,  
dike nake ji xew şîyar nabe. Hêdîka pê hesiya ku ne di xew da ye!

Hîna rebenê wilo dipûnije, Hirçî got: "Ji îro û pê ve tu kebanîya min û,  
tu yê bibî dêya zarokên min."

Wê pepûka Zerka Zêran bibêje çi!? Hema bêdeng ma û bi çavên matmayî li  
derdora xwe dinihêrî.

Li gund dinya xerab bûbû, bav û birayêñ Zerka Zêran li ser wê dîn û har  
bûbûn û lê digerîyan. Deverek nema bû ku ew lê negeriyabûn, lê her car  
boş û destvala vedigerîyan malê.





Çend sal bi vî halî derbas bûn, Zerka Zêran jî du zarok jê ra çê bûbûn, lê Hirç devê şkeftê asê kiribû û nedîhişt Zerka Zêran û her du zarok jê ber bîkevin.

Hirç jî mal û zarokên xwe ra xwarin dianî û danê êvarê her bi wan ra dima. Her sibeh Zerka Zêran dihate devê şkeftê û çavlîrê dima, li benda çareyekê bû ku jî nav lepêñ Hirçî riha bibe.

Bi serê min ne bi yê te, carekê Zerka Zêran li devê şkeftê rûniştî bû, jî nişkan ve dengê bilûra Şivanekî ji dûr ve hat, wê di dilê xwe got: "Hebe, nebe, ev Şivanê mala bavê min e!"

Jîkel rabû ser xwe û bi dengekê bîlind bang kir û got:

"Wa Şivano!

Şivanê mala bavê mino.


Pez berda mîrga mezino.

Ez Zerka Zêra me, xwişka heft bira me.

Ev çend sal in, ez dîl û girtîya devê hirç û gura me!"

Lê bersiv tîne bû!





10



Karê Zerka Zêran ev bû; her roj jî şeveqê û heyâ derengî êvarê li devderîyê şkeftê dima.

Hemû rojên wê wisa derbas dibûn, lê hêvî û omîda xwe qet nedibirî!

Rojekê Zerka Zêran li ber devderîyê şkeftê rûnişfî bû; nêrîyek hat û nêzîkî şkefta wê mexelt û ew gîyayê ku li ber derî şîn hatibû, devê xwe avêtê û xwar.

Zerka Zêran li nêrî nihêrî û got: "Ev nêrî jî kerîyê pez ê mala bavê min e, ez nîşanê nas dîkim!"

Kêfa wê gelekî hat, baqeka gîya hilkir û da ber devê nêrî, nêrî jî xwe nêzîkî wê kir. Zerka Zêran bi lez hungulîsîka xwe jî tilîha xwe kir û bi qiloçê nêrî ve kir.

Roj çû ava; Şivan pez anî malê, dêya Zerka Zêran jî weke her roj berê xwe da axurê û kete nêv pez, dest bi duhtina pêz kir.





## Zerka Zêran



Carekê bala xwe dayê ku çirisînek ji qiloçê nêrî der dîkeve!

Yek nekire du, dest avête qiloçê nêrî, dît ku hungulîsikek bi qiloçê wî ve ye, çaxê hungulîsik ji qiloçê nêrî kişand; devê wê jev ma û xwîn dî laşê wê da cemidi!

Gazî û hewara xwe gihande bav û birayên Zerka Zêran û got: "Ka bi lez werin, eva di destê min da hungulîsika keça min e, hungulîsika Zerka Zêran e!"


Hemû li hev kom bûn û berê xwe dan cem Şivên jê pîrsîn: "Te îro pez li ku derê dicêra?"

Şivan got: "Mêrgeka mezin dî binê çiyê ra heye, mişt gîya, nefel û indeko ye!"

Roja din berbangê birayên Zerka Zêran zû ji xew şîyar bûn û bi Şivên ra çûne wê mîrga ku çêl lê dikir.

Gihan çiyê; pez li mîrgê belav bû û her çend berx û bizin berê xwe dane alîyekî û ji xwe re çêrîyan.

Her heft bira û Şivan bi çav û gavan dan dû nêrî! Carekê nihêrîn ku nêrî berê xwe da qurçikekê û hêdîka ji xwe ra dicêre û pê ra dimeşe.





Nêrî berê xwe dida şkeftekê û hêdî hêdî xwe nêzîkî devê wê dikir, birayêñ  
keçikê xwe di ber kendalekî da veşartin.

Hîna wîlo û ji nişkan ve dengê Zerka Zêran ji dûr ve hat, digot:

"Wa Şivano!

Şivanê mala bavê mino.

Pez berda mîrga mezino.

Ez Zerka Zêra me, xwişka heft bira me.

Ev çend sal in, ez dîl û girtîya devê hirç û gura me!"

Birayêñ wê di cih da dengê wê nas kirin û bi lez berê xwe dan şkeftê.

Gihan derîyê wê û bang li Zerka Zêran kirin û gotin: "Em birayêñ te ne.

Va em hatin bi hewara te ve!"

Dema Zerka Zêran dengê birayêñ xwe dike, gelek şad dibe, dibeze devê şkeftê  
û ji wan ra dibêje: "Devê şkeftê gelekî asê ye!!

Divê hûn leza xwe bikin çareyekê ji min ra bikin berî ku Hirç were û we  
parçeparçe bike."





**Her heft bira bi hêza xwe devê derî dan alîyekî û xwişka xwe ji şkeftê der xistin.**

**Zerka Zêran û her heft birayên wê dev ji şkeftê berdan û çûn malê.  
Zarokên Hirç jî di hundir da hiştin.**

**Êvarê hirç hate malê ku ci bibîne!**

**Devderîyê şkeftê vekiriye. Derbasî hunderê şkeftê bû. Zerka Zêran nedît.  
Ji zarokên xwe pirsî: "Ka dêya we kanî?!"**

**Zarokan got: "Her heft xalên me hatin û wan ew bir!"**

**Dema Hirç wisabihist, har û dîn bû, çavêwî sor bûn, pîrça wî rabû.**

**destêw xwe avête yekî ji zarokan û ew li bin guhê şkeftê xist.**

**Kurê dîn xwest bireve, lê bi stûyê wî girt û ew jî li bin guhê şkeftê xist.**





Hirç bi serê çiyayan ket û nema zanibû ci bike, dipûnijî ci bike ci neke!  
Dawîyê çareyek dît. Biryar da ku here û lê bigere.

Vegeriya şkefta xwe û tûrîkekê tijî zêr bi xwe re bir û çû nêzîkî mala Zerka  
Zêran.

Dest pê kir di nava sîkak û şiverêyan da meşî û bang dikir: "Werin! Werin!  
Werin ken bi zêr! Ken bi zêr!"

Wî bang li keç û jinêñ diranbizer dikir, ji ber Zerka Zêran diranekê wê yê zêr  
hebû, dixwest wê wilo peyda bike û dema were cem;  
wê li pişta xwe bike û birevîne.  
Lê rojek, du, sê; vala bû, negîha tiştekî!

Çi qas digeriya nedigeriya ew nedidît. Dawîyê Hirç biryara xwe ya dawî da û  
got: "An ji text e, yan ji bext e! Ez ê herim êrîşê berdim ser hemû malan heya  
wê bibînim. Ez ê wê bi zor bibim û herim. Çi dibe bila bibe."





Vegeriya şkefta xwe, rahişte destarê xwe yê giran û berê xwe da gundê Zerka Zêran.

Giha derîyê mala bavê wê û bang kir: "Ez Hirçê deşt û çiya me, ez mîrê Zerka Zêran .im. Ez hatime yan kuştî yan jî hiştî!"

Birayêñ Zerka Zêran qerebalixek li derive bihîstin.

Der ketin ji der ve ku ci bibînin. Hirç hatiye êrîşê û agir ji çavêñ wî dibare.

Bi lez rahiştin tîr, kevan û rimêñ xwe û berê xwe dan Hirçî.


Hirç ji şewata nava xwe, destarê giran diavête wan, lê ji ber giranîya destêr; di ser serê wan ra diçû.

Şerê wan demekê dom kir.



Dawîyê her heft birayan hêza xwe kirin yek, bi hev ra tîr û rimên xwe avêtin Hirç û kuştin.

Pişfî kuştina Hirç, kesên li wê herêmê dîjîyan ji zordarıya Hirç xîlas bûn û heft roj û heft şevan kirin dawet û dîlan.



# ARA ZAROK

Çêja jîyîna zarokêñ Kurdan e!

